

# ÇEND DOKUMENT JI SERDEMA MÎR EVDALÊ BOTÎ SEVERAL DOCUMENTS FROM THE PERIOD OF MÎR AVDAL BOTÎ

Yusuf BALUKEN\*

Mîr Evdal, herî zêde bi çîroka evînî ya navdar “Mem û Zîn”ê tê zanîn. Ji bilî vê çîrokê, kes nizane Mîr Evdal kî ye, kengê jiyaye û di serdema wî de ji bilî vê trajediya evînê çi qewimiye. Navê Mîr Evdal ê rastî Ebdullah e. Lêbelê di zimanê Kurdî de Ebdullah bûye Evdal. Leqeba wî jî Zeyneddîn e. Navê bavê wî dîsa Ebdullah e. Li gor adetên Kurdistanê, ên ku di zaroktiya xwe de ji bavê xwe sêwî dimînin, navê bavê wan li wan tê danîn. (Şerefname, c. I, r. 131) Dibe ku navlêkirina Mîr Evdal jî bi vî awayî be. Ehmedê Xanî di kitêba xwe ya navdar de (Mem û Zîn) derheqê Mîr Evdal de weha dibêje: “Di ne’ta hakimê Bohtanê xudanê îqbal Emîr Zeyneddîn bin Emîr Ebdal” (Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, r. 69) Ehmedê Xanî di kitêba xwe de tenê leqeba Mîr Evdal nivisiye.

Navê bapîrê Mîr Evdal Seyfeddîn e. Di sala 1383ê zayînê de Mîr Seyfeddîn wefat kiriye. Piştî mirina wî birayê wî Mîr Îzzeddîn Ehmed ketiye şûna wî. Ji kurên Mîr Seyfeddîn Ebdullah bûye mîrê Tanzê û Ebubekir jî bûye mîrê Finikê. (Îbn Hecer el-Esqelanî, c. II, r. 280)

\* **Wanêbêj, Zanîngeha  
Mardin Artukluyê,  
Fakulteya Îlahiyatê, Beşa  
Dîroka Îslamê, Mêrdîn,**

Turkiye. / Lecturer, Mardin  
Artuklu University, Theology  
Faculty, Department of  
Islamic  
History, Mardin, Turkey.  
e-mail:  
yusufbaluken@gmail.com

Em nizanin Mîr Evdal kengî ji dayik bûye. Li gorî çavkaniyeke Suryanî di sala 1430yê zayînê de Mîr Evdal bûye mîrê Cizîra Botan. (Appendix of the Chronography of Gregory Abu'l-Faraj, c. II, r. XXXIX) Li gorî eynî çavkaniyê Mîr Evdal di sala 1458ê zayînê de wefat kiriye. (Appendix, c. II, p. XLIII) Yanî Mîr Evdal nêzî sî salî mîrektîya Botan kiriye. Mîr Evdal ji bilî Cizîrê li Sêrtê jî desthilatdarî kiriye. (Appendix, c. II, p. XLI)

Em di vê xebata xwe de avahiyek (medreseyek), du heb gor û sê heb jî diravên ku bi serdema Mîr Evdal ve giredayî ne didin nasandin.

## A. NIVÎSTEKA MEDRESEYA MÎR EVDAL / THE TEXT OF MÎR AVDÂL'S MADRASAH

Ewilî em behsa avakirina Medreseya Mîr Evdal dikin. Nivîsteka ku li ser dîwarê medreseyê ne bi kevirên kils hatiye çêkirin. Mixabin kevirên wusa ji ber têsîrên derveyî zu xera dibin. Nivîsteka avakirina medreseyê ji sê beşan pêk tê. Nîveka beşa ewil ji ber baran û tavê xera bûye. Bi qasî ku me xwendiyê tê de besmele heye. Beşa duyemê tamam e û tê de navên Mîr Evdal, bavê wî û kalikê wî hene. Beşa sêyemê dîsa wekê ya ewilî ji ber baran û tavê bi tevahî heliyaye. Di vê beşê de bi ihtîmaleke mezin dîroka avakirina medreseyê hebûye. Herçiqas ev beş, li gorî ku tê rîwayetkirin, berê ji aliyê kesekî bi navê Mela Xelef ve hatiye xwendin jî, lê mixabin îro nayê xwendin.<sup>1</sup> Dibe ku vê çaxê ev beşa sisiyan hatibe xwendin. Em niha dixwazin van nivîstekên medreseya Mîr Evdal ji nû bixwînin.

### 1. Orjînal Nivîstekê



Nivîsteka Medreseya Mîr Evdal

### Deşîfrasyona Wê

بسم الله الرحمن الرحيم  
 هذا ما تطوع  
 عبد الله بن عبد الله بن  
 سيف الدين البختي رحمهم الله  
 .....  
 .....

### 3. Transkrîpsiyona Wê

Bi ism Allāh al-Raḥmān al-Raḥīm  
 Hāzā mā taṭawwa‘a  
 ‘Abd Allāh bin ‘Abd Allāh bin  
 Sayf al-dīn al-Buḥtī Raḥimahum Allāh

1 Abdullah Yaşın di xebatên xwe de dîroka avakirina medreseyê wek 840ê koçî û 1437ê zayinî pêşkêş dîke. Me bi wîre telefon ra xeber da. Gor gotina wî nivîsteka medrese ji aliyê Mele Xelef Yildirim hatibû xwendin. Mele Xelef ji Cizîrê bu li wir seydatî kiriyê. Di sala 1971ê de wefat kiriyê. Rehma Xwedê li ser wî be.

#### 4. Wergera Wê

Bi navê Xwedayê Dilovan û Dilovîn

Ev xêra.....

Ebdullah kurê Ebdullah kurê

Seyfeddînê Buxtî ye. Rehma Xwedê li ser wan be.

.....  
.....

#### 5. Its Translation

In the name of Allah the most Beneficent the most Merciful

This is volunteered .....

by Abdallah bin Abdallah bin

Saifaddin al-Bukhti. God's mercy for him.

### B. NIVÎSTEKA GORA MEM Û ZÎNÊ / THE TEXT OF THE TOMB OF MAM Û ZÎN

Ji hêla dî ve Mîr Evdal di sala 854ê koçî û 1450/1451 de di evîndariya Mem û Zînê de bûye sebebê trajediyeke dijwar. Ji ber fesadiya Bekirê Ewanan pêşî Mem di zindanê de wefat kiriye. Piştî wî ji Zînê xwe kuştiye. Mîr Evdal ji ber vê bûyerê pir xemgîn bûye û her du evîndar jî di gorekê de veşartine. Di kêlên ku danîne ser gora wan de dîroka mirina van her du evîndaran hatiye nivîsîn. Her du kêl jî heta niha hatine parastin. Me nivîstekên van her du kêlan bi vî şeklî xwendin.

#### 1. Nivîsteka Gora Mem

##### 1. 1. Wêneyê Wê

##### 1. 2. Deşîfrasyona Wê

توفي في سنة أربعة وخمسين  
وثمانمائة رحمه الله  
عليهما وعلى جميع المسلمين

##### 1. 3. Transkrîpsiyona Wê

Tuwuffiyâ fî sanah arbaah wa khamsîn  
wa thamân miah Rahmah Allâh  
'alayhimâ wa 'alâ jamî' al-muslimîn

##### 1. 4. Wergera Wê

[Ev mêr] di sala heşt sed û pêncî û çaran de mir.  
Rehma Xwedê li ser her duyan û hemî misilmanan be.



### 1.5. Its Translation

He died in the year of fifty four and eight hundred  
Mercy God to them and to all Muslims

## 2. Nivîsteka Gora Zînê

### 2 1. Wêneyê Wê

#### 2. 2. Deşîfrasyona Wê

توفيت في سنة أربعة  
وخمسين وثمانمائة رحمه  
الله عليهما وعلى جميع المسلمين

#### 2. 3. Transkrîpsiyona Wê

Tuwuffiyât fî sanah arbaah wa khamsîn  
wa thamân miah Rahmah Allâh  
'alayhimâ wa 'alâ jamî' al-muslimîn



#### 2. 4. Wergera Wê

[Ev jinik] di sala heşt sed û pêncî û çaran de mir.  
Rehma xwedê li ser her duyan û hemî misilmanan be.

### 2.5. Its Translation

She died in the year of fifty four and eight hundred  
Mercy God to them and to all Muslims

## C. DIRAVÊN MÎR EVDAL / THE COINS OF MÎR AVDÂL

Mîrektiya Bohtan di nav mîrektiyên Kurdan de bi serxwebûniya xwe derketiye pêş. Lewma mîrên vê malbatê diravên ku di bazirganiyê de hatine bikaranîn li ser navê xwe çap kirine û di xutbeya nimêja inê de navê xwe dane xwendin. Mîr Evdalê Bohtî jî di serdema xwe de bi navê xwe diravên zîv dane çap kirin. Bi qasî ku hatiye tesbîtkirin, di serdema wî de sê cûre dirav di du çapxaneyên cihê de hatine

çap kirin. Yek ji van çapxaneyî Cizîrê, ya dî ji ya Sêrtê ye (Lutz Ilisch, 1978, rp. 1-5).  
 Li jêrê em dê cî bidin deşîfrasyona van diravan:

### 1. Dirâvên Cizîrê-I<sup>2</sup>



#### 1. 2. Deşîfrasyona Wê

عبد الله بن عبد الله رحمهما الله  
 لا إله إلا الله محمد رسول الله  
 ضرب جزيره

#### 1. 3. Transkrîpsiyona Wê

‘Abd Allāh bin ‘Abd Allāh Rahima humā Allāh  
 Lā ilāha illā Allāh Muhammadun Rasūl Allāh  
 Duriba Jazīrah

#### 1. 4. Wergera Wê

Ebdullah kurê Ebdullah rehma Xwedê li ser her duwan be.  
 Ji bilî Ellah tu îlah tune. Mihemmed qasidê wî ye.  
 Li Cizîrê çap bûye.

#### 1.5. Its Translation

Abdullah bin Abdullah Mercy of God for them  
 There is no God besides Allah  
 Muhammad is the messenger of Allah  
 Minted in Jazira

2 [php.xednI/moc.snioconore.www//:ptth û 037=tol&253=dis&tol=p?php.n/moc.sdibsimun.www//:sptth](http://php.xednI/moc.snioconore.www//:ptth û 037=tol&253=dis&tol=p?php.n/moc.sdibsimun.www//:sptth)

## 2. Dirâvên Cizîrê-II<sup>3</sup>



### 2. 2. Deşifrasyona Wê

المؤيد بنصر الله أمير عبد الله بن عبد الله  
رحمهما الله ضرب جزيره

لا إله إلا الله محمد رسول الله  
أبو بكر عمر عثمان علي

### 1. 3. Transkrîpsiyona Wê

Al-Muayyad bi nasr Allāh Amīr ‘Abd Allāh bin ‘Abd Allāh  
Rahima humā Allāh Duriba Jazīrah  
Lā ilāha illā Allāh Muhammadun Rasūl Allāh  
Abū Bakr ‘Umar ‘Uthmān ‘Alī

### 2. 4. Wergera Wê

Mîr Ebdullah kurê Ebdullahê ku bi alîkariya Xwedê hatiye serfirazkirin  
Rehma Xwedê li ser her duwan be.

Li Cizîrê çap bûye.

Ji bilî Ellah tu îlah tune. Mihemmed qasidê wî ye.

Ebubekir, Umer, Usman, Elî.

### 2.5. Its Translation

Supported with victory of God Emir Abdullah bin Abdullah Mercy of  
God for them  
Minted in Jazira

There is no God besides Allah  
Muhammad is the messenger of Allah  
Abu Bakr Umar Uthman Ali

3 <https://www.numisbids.com/n.php?p=lot&sid=352&lot=730> û <http://www.eroncoins.com/Index.php>



### 3. Dirava Sêrtê<sup>4</sup>

#### 1. 1. Wêneyê Wê



#### 1. 2. Deşifrasyona Wê

عبد الله بن عبد الله رحمهما الله  
حاكم سعرد

لا إله إلا الله محمد رسول الله  
أبو بكر عمر عثمان علي  
ضرب سعرد

#### 1. 3. Transkrîpsiyona Wê

‘Abd Allāh bin ‘Abd Allāh Rahima humā Allāh  
Hākim Si‘ird

Lā ilāha illā Allāh Muhammadun Rasūl Allāh  
Abū Bakr ‘Umar ‘Uthmān ‘Alī  
Duriba Si‘ird

#### 1. 4. Wergera Wê

Ebdullah kurê Ebdullah Rehma Xwedê li ser her duwan be.  
Hukimdarê Sêrtê

Ji bilî Ellah tu îlah tune. Mihemmed qasidê wî ye.  
Ebubekir, Umer, Usman, Elî.  
Li Sêrtê çap bûye.

4 [http://db.stevealbum.com/php/lot\\_rtl.php?site=1&lang=1&sale=280&lot=728](http://db.stevealbum.com/php/lot_rtl.php?site=1&lang=1&sale=280&lot=728)

### 1.5. Its Translation

Abdullah bin Abdullah Mercy of God for them  
Governor of Si'ird  
There is no God besides Allah  
Muhammad is the messenger of Allah  
Abu Bakr Umar Uthman Ali  
Minted in Si'ird

### Çavkanî

Appendix of the Chronography of Gregory Abu'l-Faraj, (Trc.: Ernest A. Wallis Budge) London, 1932.

Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (Çap. Tehsîn İbrahim Doskî) Duhok, 2008.

İbn Hecer el-Esqelanî, *İnbau'l-Xumr bi Enbai'l-Umr*, (Thq. Hesen Hubşî) Qahire, 1969.

Lutz Ilisch, Die Muenzen der Buhti von Gazira, Muenstersche Numismatische Zeitung, Vol. 8, no. 80/81, pp. 1-5, 1978.

Şerefyan Bedlîsî, *Şerefname*, (Edit. V. Veliaminof Zernof) St. Petersbourg, 1860.